

Helbestvanê mezin

Melayê Cizîrî

1568– 1740

Melayê Cizîrî navdartirîn helbestvanê kurd e. Helbestên wî ciwan, rewan, sivik û kûrwate ne.

Dîwana wî ya ku ji 125 helbestan pêk dihêt li bal me kurdan wek pirtûkeke pîroz têt qebûl kirin. Ev dîwana wî bi sedan salan li seranserê mizgeftên Kurdistanê dihat xwendin. Bi hezaran feqe û melayan helbestên wî ji ber dikirin. Ev dîwana Melayê Cizîrî gelek caran li Kurdistanê û derveyê Kurdistanê hatîye çap kirin û gelek vekolînên zanistî û akademîk li ser hatine kirin.



Melayê Cizîrî ji bilî ku helbestvanekî navdar bû, zanayekî serdema xwe jî bûye. Ji bilî zimanê xwe yê kurdî, wî bi erebî û farisî jî baş dizanî.

Navê wî Şêx Ehmedê kurê Şêx Mihemedê Cizîrî bû. Li Cizîra Botan jî dayik bûye. Wek zarokên serdema xwe li mizgeft û dibistanên ayînî dest bi xwendinê kirîye. Her li

Cizîrê jî çûye ber dilovanîya Xwedê û li Mizgefta Sor hatîye veşartin. Gora wî heta îro jî wek ziyaretgehekê ye, xelk bi berdewamî diçin tewafa wî.

**Şox û şengê, zuhre rengê, dil ji min bir, dil ji min
Awirên heybet pilingê, dil ji min bir, dil ji min
Wê şepalê, misikxalê dêm durrê gerdên şemalê
Cebheta biskan sema lê, dil ji min bir, dil ji min.**